

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 132) Sal 22 Tîrmeh 2017 z - 2629 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S

## Sûrye Li Ber Xeçerêyekê Ye

### Desteya sernivîser

Şeş sal xwînî di ser Sûryê re derbas bûn. Piştî şeş salan ji şerê giran, du dewletên mezin Emerîka û Firansa ku ji despêka şer de digotin seroktiya Beşşar El Esed ne rewa ye û doza rakirina wî dikirin, niha şorên xwe dikişînin û ji mandina wî re, eger demkî be jî, nabêjin na. Mirov bawer nake ku sedema guhertina helwesta wan dewletan û bilî wan jî ji ber ku B.El Esed kesekî baş, bê guneh û ji ber rewşa Sûryê de ne berpirsiyar e! Sedema



serek e ew e, ku li dirêjiya wan şeş salan guhertinên siyasî û îdyolocî yên giring ku di hundir rikberiya sûrî û serkêşiya wê bi xwe de çêbûne. Wan guhertinên balkêş û giring berê tevgerana gelê .... 2

## Efrîn Ne bi tenê ye!

Digel hemî amadekariyên leşkerî û ewlehî ku ji hêla Rêvebirya Xweser ve li navça Efrînê têne kirin, dîsa jî navça di bin gef û metirsiyên îjdil de ye. Ji aliyekî de hêzên teror wek El Nûsra û hevalbendên wê li derdora navçê diçin û tên û gef û hêrişên xwe ji ser kêm nakin; ji aliyekî din de artêşa Tirk û tîmarkiryên wê ji kom û komikên çekdar zor û gefên xwe ji ser xelkê Efrînê ranakin û jiyana efrîniyan dixin bin metirsî û bêaramiyê; ji aliyekî dîtir de sazûmana şamê jî gilêz bi devê wê dikeve û dixwaze Efrînê vegerîne (kozika xwe) wekî ku tiştek (ne hat û ne çû).

Ji wê bêtir, navça Efrînê û hemî deverên Kurdî li Sûryê ketine nav pilan, danûstandin û berjewendiyên dewletên ku destê xwe xistine nav pirsa Sûryê; her dewlet .. 5



## Nama Gernasê Gel ... Selahidîn Demirtaş



Li 4ê Mijdarê 2016an, her du serokên hevbeş ên Partiya Gelên Demokrat (HDP) Selahidîn Demirtaş û Fîgen Yûksekdağ Şenoğlu ku rojnamevaneke Tirk e, li gel deh perlementerên din ji partiya HDP, bi biryara nûnertiya giştî ya dewletê bi tewana "terorê" hatin binçavkirin. Perlementerên girtî jî ev in: Ferhad Oncû, Leyla Bîrlik, Selma Armak, Ebdela Zêdan, Idrîs Balkon, Sirî Sureye Onder, Diya Pîr, Gulser Yêldirim û Nêrsel Eydoxan; du perlemntêr jî ji ber ku ne li Tirkiyê bûn nehatin girtin, ew jî: Fêsel Sarî Yêldir û Togba Hizir Ozturk. Tewana girtiyan ew e, ku ne çûne nêrîvaniya xwe ji bo bûyerên rojên 6-7-8 2014an sebaret Kobaê ku 54 kesî tê de jiyana xwe ji dest dabûn, nedan...... 5

# Pêwîstiya Kurdan … Bêtir Bi Siyasetê Heye

**Nazdar Hesen**

Eger em li dîroka xwe vegerin, em ê bibînin ku çendî miletê me tûşî zulim, zorê, pişaftin û tunekirinê bûye, lê ewqas jî ew pêdar maye û tu carî ji bo azadî û wekheviyê ranewestiye; bi sedan serhildan û şoreş rakirine û her tim di qadên şer de serkeftî bû, lê mixabin, ew di warê siyasetê de lawaz bû, ji ber vê jî pîlan û peyman li serê me kurdan dihatin gerandin û li dawiyê jî em sernediketin.

Lê niha wek em dibînin û dişopînin, yekem car e ku dewletên navnetewî yên mezin (Rusiya û Emîrka) têkliyên xwe bi hêzên Kurdî (ypg,ypj, pêşmerge) re xurt dikin û weke hêzine sereke û bingehîn di şerê li dijî komên çete û terorîst de dibînin.



Ji ber ku ev hêzên Kurdî hêzên herî rêxistinkirî ne, dewletên navnetewî jê re bûne pesend û piştgir, ji ber wê jî alîkariya wan di hemû warên leşgerî, siyasî û diravî de dikin, ev têkilî jî dikevin xizmeta gelê me, lê li beramberî wê hêzên me rojane bi keç û xurtên xwe yên ciwan şerekî dijwar dikin, bê dudilî û bêhempa canê xwe jî didin da ku gund û bajaran rizgar bikin.

Belê, rast e em kurd beşek ji civaka Sûriyê ne û parastin û rizgarkirina xaka wê ji erk û stubariya me ye jî, çendî ev xak ji çeteyan were rizgarkirin, ewqas herêmên me wê aram û ewle jî bibin. Eva rastiyek e, lê nayê wateya ku eger xaka Sûriyê bi temamî were rizgarkirin, wê gef û metirsî jî tune bin, na! Her tim wê hebin çi ji aliyê dewleta Turkiyê ya ku her roj har û dîn dibe û bi tang û topan herêmên kurdî topbaran dike, çi jî ji aliyê rêjîmê ve û ta em nizanin ev dewletên ku niha piştgiriya me dikin, wê ta kûderê ji me re pesend û dilsoz bin, ew jî nayê zanîn?

Ji ber ku, helwestên siyasî di cihê xwe de namînin û li gor berjewendiyan têne guhartin, siberoja Sûriyê bi gelemperî û ya kurdan bi taybet ne diyar e, ji ber vê yekê jî, pêwîstiya me pirtir bi siyasetê heye û çawa em di qadên şer de serkeftî ne, divê em di siyasetê de jî wisa serkeftî bin û eger em bi xwe ne li hev bin û lêvegereke me siyasî kêm, zêde hebe û aliyên kurdî tê de necivin û bi dengekî têkiliyên xwe yên diblomasî neghînin raya gîştî, em ê îcar jî bi sernekevin û wek nivîskarê Emrîkî Conesen Randêl gotî “dîsa wê Kurdistan bimîne warê hezar şoreş, hezar hisret û hezar hêviyan e”.

---

**Sûrye Li… Dûmahîk**

sûryê ya aştiyane û azadîxwaz bi aliyekî din de dan, di encama wan de, rêxistina Îxwan Mislimîn a navdewletî, Rêzxistina El Qa`îde û hevnêrînên wan rewşa Sûryê ji destê serhildêrên sivîl û niştimanperwer revandin, li destê xwe gerandin û xistin xizmeta pirojeyên xwe yên taybet û îdiylocî, siyasî û leşkerî rewşeke yekrengî ku ji hêla şaristaniya nûjen de ne tê pejrandin av kirin; li ber bandora wê guhertinê, rikberiya ku ciyê xwe di nav pirojeya Îslama siyasî de ne girti be, nemaze ya ku çek hilnegirti be, lawaz û bê bandor bûn, baweriya dewletên ku bi qeyranê re têkildar in jî bi kanîn û hêza wan lawaz bû û ji meydana keftleftê derketin, belkî ji ber wê “Cinêv-7” jî bê encamên erênî bi dawî bû.

Li digel wan guhertinên mezin, û li gora rewşên siyasî û leşkerî ku niha li sûrî hene, baweriya dewletên wek Emerîka, Firensa û ta radeke bilind Rûsya jî bi Meclîsa Sûrya Demokrat(MSD) û baskê wê yê leşkerî Qiwat Sûrya Demokrat(QSD) bilind dibe û pişgirya wan distîne. Roja îro ESD ji hêzên rikberiyê ya herî çalak e, li dijî terorê şer dike û li ba piraniya xelkê Bakurê Sûryê cihê razîbûnê ye. Lewre jî Emerîkan MSD û baskê wê yê leşkerî QSD mîna hêzeke siyasî û leşkerî ya xudî pirojeyeke siyasî ye demokrat dinasin. Nemaze QSD hêzek e leşkerî ye zepkirî ye, cihê baweriyê ye, bi xurtî li dijî terorê disekine û şerê wê dike. Loma jî pişgirya wan jê re pirtir dibe, û eger MSD niha di cinêvên Cinêvê, Estana û bilî wan de amade nabe, lê di paşerojê de roleke wê ye bingehîn dê di çareseriya qeyrana



Sûryê de hebe û nêrîna wê dê were bihîstin.

li ber roniya van guhertinên nû di warê meydan û pirsa Sûryê de, pêwîst e ku rikberiya sûrî ya demokrat li helwestên xwe vegere, nemîne dîla helwestên nepîvayî yên (Iitîlafa Niştimanî) û hêzên çakdar ên îslama tundrew.

# Rijîma Îranê Nijadî û Olperest e

**Şukrî Dedo**



Salvegera 28an ya koçbarkirina Dr. Ebdilrehman Qasimlo û Bûyera şehîdbûna wî li gel du hevalan di 13.07.1989 an de li bajarê Viyêne – Nemsa, tîne bîra me ku heya kîjan radeyê rijîma Îranê mêjî kufikî û xwînvexwar e!

Wekî ku em dizanin, gelên Îranê li dijî Şah Rida Behlewî derketin, xwepêşandan û raperîn lidarxistin, daxweza serxwebûn, aştî û azadiyê kirin û di 16.01.1979 an de Şah reviya derve, rijîma wî di 11.02.1979an de hilweşî û Îranî şad û dilxweş bûn.

Lê mixabin! Kêfxweşiya xelkê dirêj nekir, li roja 01.02.1979an dema ku Xumeynî ji Parîsê vegerî, wî şîfre û reşbeleka Destura (Komara Îran a Îslamî) di balefirê de radestî meriv û şêwirmendê xwe Sadiq Tebtebaî kir. Dest bi ava kirina (Encûmen, Pasewan, Dadgehên şoreşger…) kir, hêz û kesên nerazî bidûrxistin, û bi darê zorê, di rapirsîneke fiç de, meha Rêbendan 1979 an, ew Destur a kevneperst ji Îranê re kire rêbaz; Tevgera û mafên miletên ne Faris (Kurd, Ezerî û Ereb… h.d.), mirovên Kominîst, Demokrat û lêbiral bin pê kirin, hatin girtin yan kûştin, û herweha rewşa kambax ta roja îro berdewam dike.

Ji kevin de, li derbarî gelê Kurd li Îranê, nêzî 10 miliyon kes li ser xaka xwe dijîn, siyastek nijadperest, nepejrandina hebûna û mafên netewî wî û dijitiya tevgera wî ya siyasî ya welatparêz û demokrat didome. Komara Mahabadê hate ruxandin; Qadî Mihemed û hevalên wî, Silêman Me`înî – sekretêrê partiya demokrat a Kurdistan – Îran, Qasimlo û hevalên wî, Dr.Sadiq şeref Kendî û hevalên wî, bi hezaran siyasetmedar û çalakvanên Kurd hatin bidardakirin û kuştin, û bi deh hezaran hatin zîndan û îşkencekirin, ji bilî kirîzên civakî û aborî.

Ayetulah Xumeynî û rijîma mileyan, bi navê dîn û diyantê û baweriyên xwe yên Olperest, di paş de jî nijadperestiya (Farisî), di riya rijandina peran, gurkirina mezhebê Şi'î, bikaranîna Camî, Huseyînî, Televeziyon û hemû alavên raghandinê, li gel rol û çalakiyên Pasewana Şoreşger- Feyleq El Qudis û serokê wî general Qasim Silêmanî, xwest (şoreşa) xwe ya îslamî di herêmê de belav bike. Bi ew rêbaza nijadî û olperest, Îran gihişte asteke siyasî û leşkerî ye bilind, û di rojhilata navîn de roleke xurt bilîze û bibe beşek sereke di nakokiyên herêmî û navnetewî de. Roja îro rola wê ya fereh û giran di Îraqê, Sûriyê, Yemenê, Libnan û Filestînê de, ne ji bo berjewendiyên gelan û mirovatiyê ye. Ked û alîkariya Îranê li rex rijîma Sûriyê ya sitemkar û zordar aşkere û mezin e; ew li dijî serhildana hemû pêkhateyên gel û daxwazên wan yên dadmend disekine, ji bilî ne erêkirina wê li ser maf, hebûn û rola Kurdan li bakurî Sûryê.

Mixabin, demek dirêj divê da ku, guhertinên erênî û cur be cur bi cî bên, hêz û kesên demokrat û mirovhez destên xwe bidin hev, li ser riya ruxandina raman û siyastên nijadî û olperest xebateke xurt û bêhempa bikin, da ku aştî, azadî û wekhevî û avakirina mercên biratî û pêkvejiyana gelan pêk werin.



---

**Facebook**

## Qamişlo …
## Bûka kurdan ...



**Kone Resh**

27.07.2017

Ezbenî! Berî salekê wek iro teqîna Qamişlo a malwêran bû.

Qamişlo..! Tu ketiye dilê me de û jê dernakevî! Te hêlîna xwe di peravê bîranînên me de çêkiriye û têde razaya ye..! Tu ew bajar e; Yê ku me hezê kiriye; Sînga wê, ji kul û xem, kêf û şahiya me re vekiriye û firehe.. Qamişlo! Xwîna me, mîna keriyê pezkovî, di hêrikên sibehên te de diçêre.. Ne xeme em ê şal û şapekî Botanî ji te re birêsim.. Û kum û kolozekî Xerzanî amade bikim.. Her tê bimînî bûka Cizîrê, bûka kurdan..



# Şêwrên Ji Bo Yekîtiya Netewî Ya Kurdistanê Pêş Ve Diçin

Piştî hin amadekarî û danstandinan, Kongreya Netewî ya Kurdistan – KNK, di rojên 15 – 16 / 07 / 2017 an li bajarê Silêmaniyê – Kurdustana Îraqê, di Hola Telarî Hun-er de, bi beşdarîya zêdetirî 300 kes, ji nûnerên Part û aliyên siyasî, hin perlementerên kurd, mamosteyên zanîngehan, herweha nûnerên rêxistinên sivîl û vekoler û kesatîyên serbixwe, rewşenbîr, nivîskar û zanayên Olî, ji çar perçeyê Kurdistanê û dervayî welêt, civîna Şêwra Yekîtiya Netewî ya Kurdistan li dar ket. Sed û dozde gotin hatin pêşkêşkirin, axaftinên cur be cur diyar bûn û encamên civatê di belgeyeke taybet de belavbûn.

Di pêşgotina belgeyê de hat: "Ji bo Kurdan xetereya bingehîn parçebûna siyasî nakokiya navxwe ya gelê Kurd e. Heger Kurd vê parçebûnê bidin aliyekî û yekîtiya neteweyî saz bikin, di demeke kin de ev dê hem gef û xetereyan ji holê rake, hem jî wê karibin li çar parçayên Kurdistanê statuya ku dixwazin saz bikin û xwe bigihînin azadî û serferazîyê."

Xalên sereke yên daxuyaniyê ev bûn:

-Hemû partiyên siyasî, nûnerên saziyan û kesayetên hêja ku tevlî şêwra KNK bûne, ji bo pêwistiya yekîtiya neteweyî nêrînên xwe anîne ziman û destnîşankirin ku di vê mijarê de ewê hemû berpirsyariyên ku dikeve




ser milê wan bi cîh bînin.

-Hemû beşdarên şêwra KNKê, diyarkirine ku divê xebatên yekîtiya netewî bi vê şêwrê re sînordar nemîne û heta Kongreya mezin a Kongreya Neteweyî were kirin. Bê navber ev şêwir berdewam bibe û di vî warî de biryardariya xwe nîşan dane.

-Ji bo ji rêbaz û kêmasiyên xebat û hewlên berî niha hatine meşandin, ezmûn were girtin û ev rewş dubare nebe, di wê nêrînê de ne ku weke rêbaz, ev xebat divê bi gavên ewle û bi nîqaş û biryardariyan dewam bike.

-Piştî ev şêwra han ya ku hatî encamdan, ji bo pîvan, rêbaz û xalên bingehîn ên yekîtiya neteweyî were giftûgokirin û bigihêje encamê, biryar hatiye girtin ku ev derbasî qonaxa duyemîn bibe.

-Pîvan û rêbazên yekîtiya neteweyî kilîta pêkhatina yekîtiya neweyeyî ye. Ji ber vê yekê divê ev mijar hem ji aliyê partiyên siyasî, dînamîkên neteweyî û niştîmanî, hem jî ji aliyê rewşenbîr, nivîskar, ekedemîk, hunermend, oldaran, pêşengên civakê û jinên Kurd ve bi awayekî lezgîn û berfireh were nîqaşkirin. Ji bo vê şêwra me biryar daye ku li Bakûr, Başûr, Rojhilatê Kurdistanê, Rojava û Ewrûpayê û derveyê welat xebateke dewlemend ya bi vî rengî were meşandin. Weke gava duyemîn, armanca me ew e, ku ev encamên ku di warê pîvan û xalên bingehîn de li van parçeyan derketiye holê, di şêwra duyemîn de ku bi beşdariya hemû parçeyên Kurdistanê û Ewrûpa û Cîhanê were pêkanîn û temamkirin.

-Weke pîvan, çawa ku di gava yekemîn de xuya bû, di gava duyemîn de jî şêwra me hewl bide ku hemû alîyan beşdarî xebatên yekîtiya neteweyî bike. Ji ber vê yekê biryar daye ku ji bo aliyên ku di gava yekemîn de tevlî nebûn, an jî nikarîbûn tevlî bibin di vê xebatê de cîh bigirin, hewldanên xwe dewam bike. Xebatên yekîtiya netewî heta dawiyê wê ji tevlîbûna hemû aliyan re vekirî be û bi armanca ku hemû beşdar bibin bête meşandin.

-Weke encam, bi erênî hatiye dîtin ku KNK ji gava duyemîn ya vê xebatê re jî pêşengiyê bike û organîze bike. Her weha hatiye destnîşankirin ku KNK dema li her parçayekî xebatê dimeşîne, bi awayekî berfireh aliyên din jî tevlî bike û piştgiriya wan bigire.

-Piştî ku di warê pîvan, rêbaz û xalên esasî de ku were meşandin, nêrîneke hevbeş derket holê, êdî wê dema gava seyemîn dest pê bike. Berî em derbasî vê qonaxê bibin, wê were armanckirin ku ji bo gava seyemîn ango ji bo xebatên komkirina Kongra Netewî komîteyek were sazkirin. Bê guman ev komîte wê ji hemû nûnerên partiyên siyasî û hin kesayetên serbixwe pêk bê.

-Beşdarên şêwrê êrîş û gefên ku li ser tevahî Rojava û bi taybetî li ser Efrînê hene, wek êrîşên ser xwe dibînin û bang li gelê Kurdistan û raya giştî dikin ku xwedî lê derkevin. Herwiha bangewazî ji bo avakirina Şengal dike.

-Giyanê lêborînê û bihevrejiyanê ya gelên Kurdistanê, baweriyên cuda û hemû pêkhateyên etnîkî, rêzlihevdugirtin û qebûlkirina hevdu, zaminê xweşjiyaniyê ye ji bo hemûyan. Herwesa hêviyên sazkirina civakeke mirovî ye tendrust û demokratîke di paşerojê de. Gehiştina vê armanca mirovî, dostanî hevaltiya gelên cîhanê misoger dike.

**Efrîn Ne … Dûmahîk**

û aliyek dixwaze kefa mîzana xwe dagerî be û helwesta xwe li meydana şer û siyasetê xurt bike; di wî warî de jî herêma Bakurê Sûryê kerteke sereke ye, bi taybetî jî navça Efrînê. Lê di nav wan dewletan de baş xuya bûye, ku Tirkiyê xudana pêlana xinantir û neyarê sereke ye ji Kurdan re, bi taybetî jî ji Efrînê re.

Ji ber vê rewşa metirsîdar a li derdora Efrînê, û ji bo ku pêlan û kiryarên dewleta Tirk di tenga gelê Kurd û navça Efrînê re tazî û riswa bikin û pêlanên bi raya giştî ya cîhanî bidin nasîn, Efrînî, alîgir û xemxwarên xelkê navçê ji despêka miha Tîrmehê de rûneniştine, li her derekê û cihên ku lê belav dibin li ser lingan bûn.

Bi deh hezaran mirovên me li bajarê Efrînê, deverên Şikaka, Cindirêsê, Reco Kobanê Dêrikê û bilî wan jî xwepêşandan li dar xistin û yekîtî û pêdariya xwe li hember hêriş û gefên dewleta Tirk û têmarkiriyên wê nîşnadan. Li Ewropa jî bi hezaran Kurd li dewletên mîna Nemsa, Belcîka, Birêtaniya, Almaniya sekn û xwepêşandan li dar xistin û helwest û gefa dewleta Tirk li ser Efrînê şermezar kirin.

Bê guman ev karekî pîroz e ku hevalên PYDKs, hêz û partiyên û dostên gelê kurd pê radibin. Erê xelkê me û hêzên siyasî û leşkerî li welêt biryara xwe dane ku ta dawiyê ji ber ax û welatê xwe ve berevaniyê bikin, lê gava ku ew van kar û çalakiyan dibîne,





agahiyan li ser dibîhîse, ew di xebat û berxwedana xwe de bi çoştir dibin, dibînin ku ew ne bi tenê ne û nas dikin ku dost, heval, pişgir û xwediyên xwe hene.

**Nama Gernasê … Dûmahîk**

Serokê Tirkiyê Receb T. Erdoxan di hevdîtineke rojnamevanî de bersiva pirsa serbestberdana S. Demirtaş û hevalên wî wiha da: “Maf di destê min de tuneye ku ez wî serbest berdim, çinkî ew kesê ku win çêrê dibin Terorîst e”.

Pişt re, wek bersivdanê ji R.T.Erdoan re, S. Demiraş namek jê re şand, tê de bersiva wî da û wiha got:

“Ew tiştên ne baş ku ji devê te derketin, li dijî vîna bi milyonan mirov e, ez wan nerindiyan li te vedigerînim... Ji heşt mihan de dadger û dozdarên giştî yên ku bi fermanên te dilivin, delîlekî tenê li ser min ne dîtine, eger delîlek li ba te hebe ez dixwazim tu radestî dadgehê bikî, çinkî ew westiyan û wan tu delîl li dijî min ne dîtin… Ez te spas dikim wekî ku te ji niha de û berî dadgehê ez darizandim û seza jî da min… Tê wê wateyê ku te dadgeh dane aliyekî û tu wate û pêgerekî ji wan re nehîşt… lê belê eger zû yan derng be ezê herim pêş dadgehê û emê li wir nas bikin kî teror û kî kuştar e!... Lê berî wê, Xwedê zane ku heryek ji me çi karî dike!...

Berpirsê siyasî yê ku di ber hemî bûyerên li welêt dibin de tu yî! Çinkî tu ji panzde salan de destlatdarê welêt î… Tu berpirsê yekê û dawiyê yî ji ber her tiştê ku bû û dibe û em zanin jî ku tu dixawzî veşêrî!… Di gel ku ez girtiyê di nav çar diwaran de me, lê tu bi tirs û bi şêweyekî ne dadmend hêriş min dikî; ev jî ne ji karên mirovekî sincîpak e… lê di gel wê jî, ez dixwazim tu vê yekê baş nas bikî: Ji bilî Xwedê ez ji kesekî natirsim… Ez li ser setema ku li min dibe, ji te û şopgirên te lêborînê nexwazim; ra ku hemî jiyana xwe jî di zîndanê de derbas bikim. Ez hîç razî nabim ku teslîm bibim û bê rûmet bijîm…!

Di riya HDP, dost û aligirên wî re, emê li hundir zîndanan û li derve jî ta dawiyê li hember faşîzmê bisekinin. Bila tu baş têbigihê ku emê bi serkevin û dîrok jî dê wê



yekê biçespîne. Ez di xwazim tu vê yekê baş zini bî, ra ku ez di hundir zîndaneke wiha de bimînim, lê wijdanê min vehesî ye, ji tiştekî natirsim, na belê ez dilşa me! Lewre jî ez ji te dixwazim ku ji bo min bi xem nebî!!.

# Dîsa Efrîn di Devê Topê De Bû!



" Şehîd Doxan Henan "

Du rojan li dû hev 15-16ê Tîrmehê, dîsa navenda bajarê Efrînê û derdorên wê ji hêla leşkerên Tirk û terorîstên wê de hat bombekirin. Di encama bombekirinê de mirovê bi navê Doxan Henan -bavê sê zarokan- jiyana xwe ji dest da û sê zarok jî birîndar bûn. Bombe li ber kuçeyên bajêr û li nav zeviyên derdorê ketin, gelek mal û mewdanê xelkê ziyan dîtin û agir jî bi zeviyan ket.

Li gora jêder û malperên ragihandinê, bombe û mûşek ji aliyê rohilat de hati bûn avêtin, ango ji hêla hêzên Tirkî ên li derdora bajarê Ezazê de û komên çekdar ku pêve girêdayî ne hatine barandin.

Em baş zanin, ev ne cara yekê ye û dê ne ya dawî be ku bajarê Efrînê û gundewarê wê tûşî bombekirina leşkerên Tirk û hêzên teror ku MÎTa Tirkan wan tîmar dike, dibe. Ne cara yekê ye jî, ku pakrewan û birîndar dikevin û ziyanên mezin digihên çandinî û arziyên xelkê. Armanca sazûmana Tirkiyê ji van karên çepel û terorîst ew e, ku Xweseriya Herêmî rûxîne, hêzên wê têk bibe, çavê xelkê bişkîne, wan mişext bike, destê xwe dîne ser tevahiya herêma Efrînê, wê radestî hêzên tundrew û teror bike û paşê ji bo berjewendiyên xwe bazarê li ser bike.

Rast e ku rewş li derdora Efrînê teng û dijwar in, û ji her aliyekî de tê guvaştin, dorpêçkirin, bombekirin û ji pênc salan zor û zext li ser xelkê wê berdewam e; lê hebûna Yekîneyên Parstina Gel, amadekariyên wan yên fereh û xebata wan a pîroz di ber parastina sînorên navça Efrînê de, dikin ku destlata Tirk, hêzên teror û ta sûzmana Sûryê jî, berî ku çi hêrişeke fere bajon ser Efrînê, deh caran hesabê xwe bikin û paşê pêlanên xwe bajon. Çinkî Tirk jî û bilî wan jî zanin, ku dagîrkirina Efrînê, kiryareke hîç ne hêsan e, qet tê de bi ser nakeve û wê li ber lehengiya gelê navçê têk biçe.

Nemirin ji pakrewanan re û çakî ji birîndaran re!.. Mirin û rûreşî jî ji hêzên tarî û rûreş re!.



" Bi kamêra Ehmedê Qitmê "

# Navendeke Nû li Gundê Kêla- Efrîn

Li roja 20ê Tîrmehê 2017an, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê navendeke xwe ye nû li binê gundê Kêla- devera Bilibilê vekir. Di ahenga vekirinê de, bi sedan dost, heval û xelkê gund û gundên derdorê amade bûn û erêkirin û şabûna xwe ji vekirina navendê re diyar kirin. Şandek ji desteya rêvebir a partiyê made bû. Parêzer Reşît Şe`ban, gotina serkirdeya partiyê got, tê de giringiya kar, xebat û yekîtiya hemî xelk û hêzên siyasî li Efrînê ji bo parastina navçê ji hêrişên terorîstan xuya kir. Hêjayî gotinê ye, ku ev navenda hejmar dozdeh e ku partiya Yekîtî li navça Efrînê vedike. Armanca wan navendan ew e, ku têkeliyê bi xelkê xwe re xurt û berdewam bike, aştiya navxweyî û civakî biparêze û ji bo her rewşên taybet amade be.





# Boneyên Êş û Şînê

Du boneyê bi êş di Tîrmehê de di ser gelê Kurditanê re derbas dibin. Di vê mehê de, du gewremerdên Kurd jiyana xwe ji dest dane û ji nav gelê xwe bar kirine. Nemirê yekê zaniyar û mirovê gewre Mîr Celadet Emîn Bedirxan bû, pakrewanê din jî Dr. Ebdirehman Qasimlo sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bû.

**Mîr Celadet Bedirxan (1893-1951):**



Piştî ku hebûn û tunebûna xwe xiste kovara hawar û warên çandeyî û sîfîl ket, ji bo ku debara jiyan xwe bike, berê xwe da çandinê, lê mixabun, li roja 15/7/1951ê “Bîra Qederê” -wekî ku wî bi xwe nav lê kiri bû- di bin lingên wî de hilweşî, ew kişande nava xwe û bû sedema mirina wî. Wek belge diyar dikin, bi sedan gernasên bajarê Şamê, kesayetiyê berpirs, efser, navdar û h.d. li dû darebest wî meşîn û govdê wî yê pak di goristan Şêx Xalid li kêleka Bapîrê wî Bedirxan Paşayê Mezin veşartin.


Mîr Celadet li 26/4/1893 li bajarê Stembûlê jidayîk bûye. Li sala 1922an Mistefa Kemal ferman da ku welatperwerên kurd bigirin û wan bikujin yan jî dûrewar bikin. Ji ber wê sedemê, Celadet û birayê xwe Kamran neçar bûn ji Tirkiyê derkevin û berê xwe dane welatê Almaniya. Li wir, Celadet li zanîngeha Laybzigê xwend û li sala 1925an Dîploma parêzeriyê ji kolîca Mafnasînê wergirt. Piştî wê, demek hindik li Misirê rûnişt, paşê di riya Libnanê re hate Şamê, ji wir jî çû li Cezîrê-Qamîşlo rûnişt û di Komela Xûyîbûnê de xebitî. Dema ku li sala 1927an Şoreşa Agirî vêket, li gel birayê xwe Kamran çûn tevlê bûn, lê dema ku şoreş têk çû, ew jî li gel serokê Şoreşê Îhsan Nûrî Paşa derbas Îranê bûn. Celadet ji Îranê jî derbas Îraqê bû û ji sala 1931ê de li Şamê bi cih bû. Piştî ku di xebatên xwe yên siyasî de bi ser neket, berê xwe da zimanê kurdî, nivîsandin û çapemeniyê. Mîr Celadet bi tîpên kurdî yên latînin ku amade kiri bûn, li sala 1932an kovara Hawarê û paşê jî Ronahî derxistin.

Li sala 1947an gava ku navê xwe wek namzet ji ber herêma Cezîrê ve ji bo perlemana Sûryê da, ew hat girtin û navê wî ji hilbijartinan hate rakirin.

Mîr Celadet bi van zimanan baş zanî: Kurdî, tirkî, almanî, erebî, farisî, firensî, yûnanî, îngilîzî û rûsî.

Gelek berhemên Mîr Celadet ên nivîskî hene, piraniya wan di warê rêzmanê de ne. Bê zêdegotin, Celadet bavê nivîsa zimanê kurdî ya hevdem û rêzmana wî ye.

**Dr. Ebdirehman Qasimlo(1930-1989)**:



Nemir Qasimlo li sala 1930î li gundewarên derdora Gola Ormiye ji dayîk bû. Li sala 1947an çû Firensa, pişt re xwendina xwe ya bilind li dewleta Çîkoslovakiya bi dawî kir û dîploma Diktora di siyaset û aboriyê de wergirt û li zanîngeha Sorbonê dersên dîrok û zimanê kurdî dan û li zanîngeha Piraxê jî dersên di warê aborî de didan. Dr.Qasimlo ji sala 1950î de di rêvebirya PDKî de kar dikir. Li sala 1971ê, piştî ku Dr.Qasilmo ji girtîgehên Tehranê hate berdan, di kongira çaran ya Partî Demokratî Kurdistana Îranê de wek sekretêrê partiyê hate hilbijartin. Li dawiya sala 1978an, li dema ku gelên Îranê li dijî Şah rabû bû, Dr.Qasimlo vegerî Kurdistanê, xebat û têkoşîna ji bo mafê gelê Kurd bi rê ve bir û li gel pêşmergiyê partiyê deverine mezin ji Kurdistanê xistin bin destlatdariya xwe. Piştî wê, di gel ku artêşa Îrana Îslamî destê xwe danî ser bajarên Kurdistanê, lê PDKî bi rêbertiya Dr.Qasimlo têkoşîna xwe berdewam kir. Li roja 13ê Tîrmehê, destlata Îranê bi bihaneya ku dixwaze goftûgoyê bi kurdan re bike, Qasimlo û du hevalên wî bi xinanî li bajarê Viyêna- Nemsa kuştin. Nûçe diyar dikin, ku destê serokê Îranê yê berê Mehmûd Ehmedî Nîcad yekser di kuştina wan pakrewanan de hebû.

Gelê Kurd bi zaniyar û gernasên xwe serbilind e. Pakrewanên xwe ji bîr nake. Ew di hiş û wijdanê gel de herdem zindî û nemirî ne. Rûreşî ji dijminên mirovahiyê û neyarên gelê kurd re.



# Silavek ji Efrînê re



**Arif Hiso**

Ev bû heft sal ku gelê Sûrî zehmetiya dikşîne, çi li vir çi li wir, nemaze gelê me yê Kurd. Duh bû Serêkaniyê û Kobaniyê, îro jî gefgur û topbarkirina Turkiyê û hevalbendên wê li ser gundên Efrînê. Efrînê jî dît û dît; ew bêtirî carakê hat dorpêçkiririn, gelek dijwarî ji hemû aliyan ve dîtin, çi di warê bazirganî, kêmbûna kelûpel, sotemenî, tenduristî û H.W.D. Bi ser ve jî bû cihê penaberên Helebê û gundewarên wê, yên ku ji ber şer bazdane. Ez û mala xwe li gundê Tilfê bêtirî salekê bûn mêvanên wê. Ew sal ji bala min naçe û wê neçe. Di xwepêşandana Efrînê de ji bo piştgiriya Kobaniyê min gotarek xwend û got: Ez ne peneber im li Efrînê, ji ber ku ez dibînim ew jî Kobanî ye. Efrînîno bila wek me li we nebe xwe bi qurban hev bikin û siloganên vebrûstî we nexapînin... Bi rastî dema ku min ew dîmenên xwepêşindana Efrînê dît, hêstir bi çavê min ketin û kêfxweş bûm. Silav ji Kobaniya berxwedanê ji kesên ku berevaniya bûka me (Efrîn) dikin. Silav ji hezkirina Efrînê re. Bimire teror. Efrîn bi xelkê xwe mezin e.

**Ji kelepûra Kurdî:**

# Kurd dibêjin: ((Kêla Me`nan Tijî Nabe!))

**Osman Îso**



Dibêjin, cotariyek hebû herdem li me`nan(bihane) digerî û jina xwe bi misasê kotek dikir. Ew ji cot vedigerî û bi jina xwe re digot:

- Te çi şîv kiriye??

- Gêrmiya şe'îre!

- Hey bêhişê! Min bi te re ne got, boraniyekê çêke!? Radibû û lê dida! Eger dema xewê jî dihat, ji hevjîna xwe dipirsî, te nivîn li kûderê rêxistiye, eger hevjîna wî bigota li hundir, digot: Min bi te re negoti bû li ser sewkiyê dîne... eger bigota, li ser sewkiyê ne, digote, min bi te re goti bû li ser xanî bike!

Hevjîna reben çi dikir bi mêrê xwe re nediçû serî.

Rojekê wê jinê gilî û gazincên xwe ji cîrana xwe re kirin. Cînara wê got:

Çareserî hêsan e, çi şîv hene hemuyan jê re bike, nivîna jî li hundir , ser sewkiyê û li ser xênî jî rêxe. Jinê rabû wilo kir!

Cotarî ji cot hat û bi jina xwe re got: Emê îro çi bikurutin?

- Mêriko! Min danik çêkiriye

-Te got çi ? Min bi te re ne got kuftan bike!

Hevjîn got: Belê! Fermo kufte!... Û her mêrê wê navê şîvekê digot , jinê jî digot , fermo, û wilo jin ji lêdanê xelas bû.

Gava dema xewê hate, mêr pirsî dê li kûderê rakeve? Hevjîna wî got: Li hûndir. Wî bi hêrs misas rakir û got: Ma min negoti bû li ser sewkiyê bike.... hey û... jinê got, mexeyde cano nivîn li ser sewkiyê jî hene.

Mêr: Ew çi sewkî ye! Ezê li ser xanî xew bikim...

Jin: Nivîn li wir jî amade ne!

Mêr şêtûmêt ma, pîspîs hilkişî ser xanî û misas jî bi xwe re bir û xwe di nav nivînê de kire kêndir, lê xew ne hate çavên wî , çawa rojek bê lêdan wê derbas bibe!?. Wî li asîmên mêze kir û ji hevjîna xwe pirsî :

Navê van stêrkan çi ne? Jin :Riya Kadizê ye. Lê ev? Jin: Leyle! Lê ev? Jin : Mecnone. Lê ev? Jin : Komka sêwiya ye û h.w.d. ta mêr got :

Lê ev stêrka li ser serî min navê wê çiye? Jin: jê re dibêjin pêwr û mêzîn...wê hîngê mêr hilpekî û misas hilanî, li jinê da û got :

Bêşermê! Te nivîna min li bin mêzînê rêxistiye da ku lîtir bi ser serî min de bikeve û ez bimrim ne!? Hey mîndik! Û kûder dêşe û kûder nêşe li jina xwe da.

Hin kes li cîhanê hene, karê wan tenê hertiştekî bikulînin; ji bilî tiştên neyînî di jiyanê de nabînin. Ew an beredayî û nezanin, an jî kîndar in. kîndar jî bi sinciya xwe mirovekî jixwere(ezezok) ye, eger kes be ji bilî xwe xwe xema kesekî naxwe, eger partiyek be jî tenê xwe zane!!

# Ji Vedenga Dîrokê

**Merwan Berekat**



Di berîkên vî çiyayê de xewnên dêpîran li ser balgiyê keserê pal dane, û di hemêza şikeftên Niyandirtalan de vedenga dîrokeke dêrîn dilorîne....

Siha xwedêwendên bê perestgeh li peravên kanî û çeman çog vedane, û dengê Eştiyax di navbera erd û ezmên de, bi keserekê ve daliqiye...

Di navika sirt û zinarên vî welatî de, kilkila hêrsên Diyako ye, û hîrhîra hespên Alalaxiyan hîn ji guhên Derya Sipî dernehatine...

Li ser lêvên gelî û newalên ku pertavên rojê li xwe digerînin, hêviyên Nazatiya çîk didin, û kila çavên Farona di bihna lale û kulîlkan de dadirive...

Li ber dawa çerx û felekê xeftanê serdeman bê bişkovk e, lêvên dîrokê hîn nizanên memikên rastiyê bi hêdî bimijin...

Şev serxweş dizêvire û tirqiyên rojê her sîleyên li ser çavên tariyê ne...

Birûskên şoreşa hebûnê ji pêdariya kurên rojê dijenin, û ewrên xapînok di paşela bizdonekiya xwe de dimiçiqin...

Belê, di hêlûn û landika vî çiyayî de, tevna jiyanê bi kirkûtê lehengiyê tê kutan, û rengên wê ji mirovperweriyê vedibrûsin..

Efrînê…!

Mîna hemû xwîşkên xwe... tucarî memikên te ji mêrxweziyê ziwa nebûe... ez dizanim na, lê dipirsim....ma carine te dijîtiya Xwedê kiriye....?!

Dilê dîlberên kezîzer di hembêza te de xewnên siberojê dimêjînin, û bihna sirûdên Varona ji sibehên te tê.... Belê hîn lîliyên Nazatiya û awirên Anahîta di nav lêvên xaka te de zîl didin....

Nexşeya te bi vîna bapîrên axperwer hatiye pîrozkirin, û hîn vedenga cirîda hespên simkodînî stranên darkuvîj û darmaziyê ne.....

Parsexatûn.... hîn çeqelên gurî mas nekirine, bi serê pozê xwe ewrên tarî bi ser deştên kîdar de vedigerîne, û bi hilma gola Meydankê çavên berbangan kil dide...

Dengek perdeya guhên min dilîskîne... sozdar in torînê te ey Hawarê pêdar! Vînvejîn î lo Lêlûnooo! Hîn çîroka tirêna dengbixwîn di xeramên geliyê Tîran de bi serdemên derewîn dikenin.

# Şagirtên Serkeftî… Hêviyên Welêt

Li ser xatirê şagirtên di astên Birovê û Bekeloriya de serkeftine û pileyên baş wergirtine, li roja 14/7/2017an, rêxistina Be`dîna- Efrîn a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê (Yekîtî) ahengeke taybet li devera Kitix li dar xist, bi dehan şagirtên serkeftî-keç û xort -, mamosteyên dibistanan, bi sedan ji malbatên şagirtian û hogor û heval lê amade bûn. Ahengê bi sirûda Ey Reqîb dest pê kir; pişt rerêzdar Mihemed Cefer bi navê rêxistina Be`dîna bixêrhatina mêvanan kir. Paşê parêzer Şêxo Bilo gotineke bi navê partiyê kir, tê de li ser giringiya xwendinê û bidestxistina zanînê di jiyana gelan de tekeze kir, ked û xebata şagirtên serkeftî bilind nirxand û





rola erênî û sereke ya malbatên wan, nemaze di van rewşê dijwar de anî ber çavan û spas kir.

Piştî wê, çend mamosteyên ku temenê xwe di mamostetiyê de borandine hatin xelatkirin û rola ya payebilind di warên fêrkirinê de hate spaskirin. Pişt re mamoste Husên Emîn gotineke giranbuha bi navê mamostan got. Piştî wê, sî û pênc şagirt ji her du astan hatin xelat kirin û şagirt Mîdiya Bekir ku 236 pile/240î wergirti bûn û pileya yekê li navça Efrînê stnadi bû gotinek bi navê şagirtan kir.

Ev ne cara yekê ye ku Partiya Yekîtî şagirtên serkeftî xelat û rûmet dike; wî ji despêka xebata xwe de, bi destxistina zanînê û zaniyariyê ji xwe re kiriye armanc. Di rewşên berê yên pir teng û dijwar de, herdem li kêleka şagirtan û malbatên disekinî, ew coş û pesend dikirin û dihevojtin ser xwendin û zanînê. Çinkî pêşdeçûna gelan bi zanîn û zanyariyê pêk tê, û civakên pêşketî û serkeftî bi mirovê xwende û zana tê avakirin.

Karmend, nivîskar û xwendevanên rojnama me Newroz wan şagirtên serkeftî pîroz dike û hêviya serkeftinê ji hemî zarokên dibistanan û şagirtan re dixwaze.

# ZIMAN HÎMÊ SEREKEYE

**Mislim Şêx Hesen**

Bêguman! Dîrokê daye nasîn ku ziman hîmê serke ye ji hebûna gelan re; parçeyek ji jiyan û çanda mirov e, ji dayîk, bav û xizmên nêz tê giritn û pê netewe ji hev tên çudakirin. Lewra hemû neteweyên ku li ser gozemînê dijîn, girîngiyeke bê sînor bi zimanê xwe yê zikmakî kirine û bi hemî şêweyan bervanî di ber de kirine, da ku ew ziman ji hole ranebe. Ji ber ku ew têgihîştine ku windabûn û tinekirina ziman, windabûna netewê bixwe ye.

Vêça zimanzan, rewşenbîr û zimanhezên kurd jî weke CELADET BEDIRXAN, CEGERXÎN, OSMAN SEBRÎ, EHMED PALO, REŞÎDÊ KURD û hin hêjayên dîtir, rewşa gelê kurd û zimanê wî ji hemû aliyan ve xwendin, herwiha niyazên




dagirkerên Kurdistanê jî dîtin, ku çawa hewildan tên kirin da zimanê kurdî ji holê rakin û karibin bi hêsanî netewa kurd ji ser zemînê hilînin. Wê yekê hîşt ku di roja 15 ê Gulana 1932 an de li paytexta Sûriyê nemir Celadet Alî Bedirxan Kovara HAWAR bi zimanê kurdî û bi tîpên latînî dameziriîne û ew kovar bi wan tîpan balkêş û navdar bû. Lê berî wê gelek rojname û kovar hebûn, mîna rojnama Kurdistan ya ku li ser destên mîr Mîqdad Midhet Bedirxan li paytexta Misrê Qahîra di sala 1898an de hat weşandin, herwiha rojnama Roja Kurd li Silêmaniyê di sala 1913 an, rojnama Jîn 1919, banga kurdistanê sal 1922 an de hatin weşandin. Lê mixabin hemû rojnameyên wê demê bi tîpên Erebî hatibûn nivîsandin; lewra jî gelê kurd li her çar parçeyên kurdistanê roja weşana Kovara HAWAR kirin roja Zimanê Kurdî, ji ber ku ew bi tîpên latînî hat weşandin.

Lê ji aliyekî din ve dîroknasan cesipandiye ku di rojhilata navîn de zimanê kurdî yê herî kevnar û dewlemend e, ew bi kok û reh û dîroka xwe digihê serdemên berî dîrokê. Her wiha tekez dikin jî, ku ew di dîrokê de rastî gelek pirojeyên herfandin û windakirinê hatiye, lê vîna gelê kurd ya bêhempa li pêşiya wan pirojeyên kirêt rawestiyaye û daxwazên şofenist û nejadperestan têk birine.

Vêça divê gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê bi awayekî rasteqîn xwedî li zimanê xwe derkeve û biparêze. Çimkî roleke zimên e girîng di jiyan gelan de heye, ji ber ku ziman raman e, hebûn e, nasname û netewe ye.

De ka em xwestek û armanca wan têkoşeran li ser zemînê nehêlin û li van gotinên Celadet xwedî derkevin: ((… Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin… Ziman jî şerta heyînê a pêşîn e)).

# DERKIRINA HESTAN

**Helbest: Merwa Brîm**



Di ber bêdera
yasemînên çavên te re
Westiye ev periya şevê
Çiqas te ber hev dike
Ewqas tu belav dibî..
Bawer bike li hember
min rikberiyê jî berîk
dirandin...
Kêr di newqa riyan de
ko bûn
Û demê nikarîbû ez ji
şîr vekirama
Ne jî palgehên milên te
ji bin serê min bikşanda
Hîn bermayên ew şeva
dawî.
tamarên min dimijin
di qebaqên berbangê de
mîna perperîkan
Bi meyrekan min
dorpêç dikî
Di avrazên rûçikên te
de
werzên kunciyan min
dîîîn.. dîn dikin
dilooo...!
Ez û peyalê...
Bi mereqa du lêvên tî re
di keviyan de.
li bihna te digerin..
ta tu dilop bi dilop
Darivî şûşeyên min...
Ku te vexwim, dem kin
e...
Te bi ser xwe de
birjînim şil nabim..
Tim zuha me...
Tiya rîşokên çavên te
me...
Tenê di xuha te de şiqin
didim
Quncik bi quncik te giyan standî
Ma tu dizanî....
neynika min jî sewdaliya te ye
Rojane..
Gava sibeh bi te aşle
dibin
Û hezar pêjnên te di giyanê min re der dibin
Ew carekê gerdenê
awirên te
Di stiwê min de dipelîne...
Û sed carî ez.....
ji ber hev dikevim..

**23/5/2017**

# Bangek ji bo yekbûnê...

**Zozan Ebdo**

Li rojavayê Kurdistanê, bahênikên azadî û têkoşînê bi nazikî dêmên Kurdistaneke nû radimûsînin, kurd û kurdewarî jî pîrozahiyên ku em li ser ji dayîk bûne ne, lê pir caran di nava zincîra yekbûna ramanên kurdî de, peyvên netewî di hestên xwedî welatpîroz de dihatin şikestin, tenê weke (gotin) diman û di nav çîmenên azadiya ramana kurdî de û li ser bahênikên nazik, bahozên bi birûsk, şer û talan dihate kirin. Rawestin! Divê em bala xwe bidin xaleke pir girîng, ew jî ew e, ku propagand û ragihanda kurdî roleke gelek mezin di qada netewî de dilîze, lê mixabin! Tv û malperên Intrnetê pir caran, ji dêvla ku tewşankên kurdîtiyê di komekê de bidin hev, ew werimandin û teqînên volkanî bi bûyeran pêktînin, bê guman ev jî morala kurdan bê hêz dike, lê reklama herî bi bawerî tê vegotin ewa ku dibêje:"Roja îro kesekî kurdan nema li Efrînê dijîn, hemûyan dev ji welatê xwe berdane û ber bi buhişta Ewrûpayê ve dibezin" . Lê dîsa jî ez nizanim ku tenê 50 hezarî kurdên xwendekar, ji kûderê hatine ?!!... Bes e, bi rastî jî bes e ji we re Rêveberên Berjewendiyên Kesayetiyê !!... Çavên xwe vekin, winê tenê bibînin ku çawa lehiya biyanî tenê dike ku em kurd mîna gêriyên moristana di bin avê de bifetisin û tune jî bibin. Çavên xwe vekin û de ka werin êdî bes e !!... Werin em dest bi destan din, mil li milan, ciwan û kal li rex hev, û tenê bankin kurd kurdewarî û Kurdistan.



**Gelo! Çi … Dûmahîk**

bi wê refleksa xwe ya dayîkbûnê a mezin hêrişî mar dike, jiyana xwe dixe metirsiyê û min ji mar riha dike. Dayîka min, xwedawenda min a yekemîn û sereke bû, çunke bavê min î ku nimûneyek ji wan zordarên rohilatî bû, çi gava dixwest li min bixe, her di gavê de û sererayî lêdan û heqaretê dayîka min yekser ji min re dibû mertal û digot: "Law kurê min guh mede vî mêrikî, vîya dîn e" û min aşt dikir. Dayîka min li hember zordariya bavê min ne bes ji bo min, di nav malê de jî tevlî birayê xwe yê mezin çi gava dixwest bi wan re şer bike, ji bo tevan xwe dikir mertal. Dayîka min xwedawenda min a yekemîn û sereke bû, çunke di gava 18 saliya xwe de bûm, di navbera Hîlwan û Sêwrekê de li nav zeviyeke ku diket navbera du rogermên biçûk ên diherikîn Robarê Firatê, bo cara dawî min palehiya genim kir û ji Mamê xwe re min got: Apo "ev cara min a dawî ye ku ezê palehiya genim bikim, ew jî heta êvarê, lê ne palehiya bavê xwe, ezê palehiya te bikim" û heta bi ro çû ava jî min palehiya mamê xwe Hadî kir. Bû êvar, gava derketim jorî rogermî li paş xwe zîvirîm û sê caran min tif hemberî wî aliyê dîtirî rogermî kir û min go: "Carek din hergîz venagerim" û hew vegeriyam. Ji wê rojê û vir ve, bi dirêjahiya tevgera xwe ya siyasî Dayîka min (Xwedawenda min) her gavê her seetê bigotina "Gelo çi bi Sînoyê min hat" radibû û rûdinişt, bi taybetî jî bi dirêjahiya jiyana min a ji dervî yasayî û ya bendîxanê. Wê hemî gavan bi duaya "Ey xweda ez mirina kurê xwe nebînim" rabû û rûnişt heta bi berî demhijmêrekê! Dayîka min xwedawenda min a yekemîn û sereke bû. Bavê min yê ku zordarekî di ser pozê xwe re bû, heger baran nebariya û genim şîn nebûya dayîka min lêxistin dixwar, yan jî tola mamê dereng hat standin, dayîka min lêxistin dixwar. Belê, heger dayîka min ji bo van tevan, bila gotiye, ew jî mîna dayîkên bi milyonan Kurd yan jî Tirk, Ereb, Rûm, Faris, ji bo peyva "wê çi bê sere zarokê min" bûye. Ji ber van egeran hemiyan Dayîka min ne bes ew bû ya ku wekû fizîkî min afirand, ji layê manewî de jî heta bi henaseya xwe ya dawî parçeyek ji jiyana min bû û ew bû ya ku bûbû egera jîndariya min. MIN JI DAYÎKA XWE HEZ DIKIR HEM JÎ JI KEVÇÎKA DIL! Şirovekirina peyva hezkirinê tiştekî sext e, tenê meriv dikare pê bijî. Dayîka min çawa şiya bêyî beranber ji min hez bike û min biparêze, min jî her wusa ji Wê hez kir û ezê nikaribim wê hezkirinê şirove bikim, lê dikarim bibêjim; "hem jî çawa min jê hez kir…" Derbarî Dayîka xwe de tenanet bêhnfirehiya min ew e ku di hemî jiyana xwe de peyveke nexoş min arasteyî wê nekiriye, helbet ji bilî hindek tiştên ku ne di destên min de bûn, heger jiyana min ya siyasî ya ku ji bo wê berdewam dibû sedemê derketina zehmetî û naxoşîyan ez neyênim zimên. Jiyana min diyar e, ji destpêkê heta bi dawî jiyana Dayîka min hemî bi gotina "gelo çi hat serê Sîno" derbas bû. Dayîka min, Xwedawenda min a yekemîn û sereke koça xwe ya dawî kir. Sibe serê sibê zû ezê li cem Dayîka xwe bim!....

***Wergerandin ji Turkî: Dildar Şeko.***

# Gelo! Çi Hat Serê Sîno?

**(Diya min sala çûnî wek îro çû ser dilovaniya xwe ...**

**Îro bîranîna sala yekemin e û ez nikanibûm biçûma ser gora wê!)**

Sibe yekemîn salvegera koçkirina dayîka min e, ango xwedawenda min a yekemîn û sereke. Par, di gava bihîstina mirina wê de nivîsa ku min ji bo wê nivîsî bû, bêyî guhertinekê dubare belav dikim. MIN DAYÎKA XWE, ANGO XWEDAWENDA XWE A YEKEMÎN Û SEREKE WENDA KIR! 24 ê TEMÛZÊ 2016- SÎNAN ÇIFTYUREK. Dayîka min ji serê 3 mehan e ku ji xwarin û vexwarinê qut



bûbû. Du caran min karî biçim seredana wê. Berî bi du rojan bi telefonê li min geriyan û gotin: Berdewam dibêje; "Sîno, Sîno", heger tu bêyî wê baş bibe. Ez li Entabê bûm, di 22ê Temûzê de çûm seredana wê. Li ber serê wê rûniştim, lê wê min nenasî. Min devê xwe xist guhê wê û bi dengekî bilind got: "Dayê ez im, ez Sîno me, ez hatim". Lê di rewşeke pir xirab de bû, ne dikarî bipeyîve û bersiva min neda. Lê diyar e hîn li ser hişê xwe bû û ji nişkav de destê min bi xurtî girt û guvaşt. Êvara 23 ê Temûzê min ew hişt û bi rê ketim, heşê min hemî gavan li ser telefona ku wê ji malê ji min re bê bû. Ew telefon 24ê Temûzê, li demjimêr 22.55an hat. Dayîka min koça xwe ya dawî kiribû! Dayîka min xwedawenda min a yekemîn û sereke bû, çunke wê wekû parçeyek ji canê xwe ez afirandibûm. Dayîka min, xwedawenda min a yekemîn û sereke bû, Ji ber ku hîna ez 3 mehî bûm, li gundekî bi ser Sêwrekê ve, li nav zeviyeke genim li ber sîbereke biçûk min dana û berra qimil ji nav genim dida. "Hela ez binêrim bê Sîno çi dike" digot û gava ji bo kontrolkirina min tê, dibîne ku marekî mezin bi min re dilîze, ............... 11

# Perlemana Turkiyê Jî Riya Rastiyê Şaş Kir !

Roja Sêşemê 11.07.2017 an, her du partiyên Turk (AKP, MHP), di civateke perlemanê de, pirojeya biryarekê pêşkêşî serokatiya wê kirin, da ku bilêvkirin van navan : "Kurdistan, Bajarên Kurd û Cînusayda Ermenan" di perlemana Turkiyê de qedexe bibin, yê ku wan peyvan wîne ser zimanê xwe dê 12000 LT ceza bide û ji beşdariya sê rûniştinan bêpar bibe.

Li ser wê projeyê, hin perlemaniyên Kurd gotin: Hikûmeta Turkiyê faşîzm e, kar dike ku cureyên azadiyê teng bibin û zimanê Kurdî bi giştî di perlemanê de qedexe bibe.

Tê zanîn ku, hikometa Turkiyê, piştî rûxandin projeya aştiyê, şer bi Kurdan re nû kir, gefgurên li dijî partiya HDP zêde kir, serokê wê birêz Selahedîn Demirtaş û hevalên wî zîndan kirin, piraniya serokên şaredariyan ên Kurd bi dûrxistin, pir navnîşan, televeziyon, ragihandin, dibistan û Înustuteyên Kurdî rêdan jê standin û qedexe kirin.

Berî vê bi mehekê jî, peykerên hin navdarên Kurd ku di nava bajarên Kurdistanê de hati bûn venandin, di nav wan peykerê mîrê helbesta Kurdî Ehmedê Xanî ji nav bajarê Bazîdê rakirin û navên kurdî yên kevin ên gelek gund û şêngehan jî vegerandin ser turkirinê.

Ev kiryarên hevbendiya AKP-MHP (Ixwanregezperest) bi rêbertiya serekomar R.T Erdoxan,



destnîşaneke aşkere ye ji siyaseta nijadperest di tenga gelê Kurdistanê û hemî gelên Tirkiyê re; ew siyaseta hîç nakeve xizmeta gelên Tirkiyê û paşeroja Tirkiyê wek dewleteke sereke li Rohilata Navîn dixe bi metirsî û gumanê û wê dajo ser kirîzeke kûr, hemî gavên erênî ku di warên aştiya navxweyî de bi kurdan, pêwendiya bi Yekîtiya Ewropa û dewletên cîhanê yên din re jî beravêtî dike û heviyên xelkê xwe têk dibe. Lê raya giştî ya navdewletî û xêrxwazên gelên Tirkiyê di wê baweriyê de ne, ku Erdoxan û tîma xwe ya Ixwancî wê di rêbaz û siyasetên xwe yên li dijî aştî û demokrasiyê de bi ser nekevin, eger ew bi çavekî erênî û hişekî vekirî ji bo avakirina tirkiyeke hemdemî û modêrn nexebite, dê di demên li pêş de rût, tazî û bê dost bimînin, û rojên xirabtir wê bi ser Tirkiyê de werin.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**